BIYAVEK

NÊRÎNEK LI EDEBÊ DÛREWELAT

Ebdilxaliq Siltan

Gelek edîp û nivîskarên kurd li dervey welatî dijîn, lewra me gelek berhemên wan li ser rûpelên kovar û rojnameyan xwendîne. Belê aye ev revenda kurd ta çi rade şiyaye derbirînê ji êş û azarên kesanê kurd ê dûrî welat dijî, bike? Aya em dikarin bibêjin nivîskarên me li dervey welatî edebekê taybet bi mişextbûnê ve peyda kiriye…?

Bêgoman em neşên bersivê bi şêweyekî hûr bidin, ji berku piraniya berhemên nivîseran ne li ber destê me ne, û her nivîserekî bi rêkekê berhemên xwe belav kirine, û çu tewer nebûn evan nivîseran li dor xwe xirve bikin, ji berku her çend berhem bi zaravekî hatîne nivisandin, û her yek li dû rênvîsekê darijtîne.

Nebûna giropeka rêxistî di nav texa edîb û nivîserên Kurd li devey Kurdistanê bûye egera hindê ku ev nivîser e bi şêweyekî berelayî berhemên xwe belav bikin. Her çende ev hindê nagehîne ku ev berhem e lawez in yan neserkevtîn e, belku dibe di nav van berheman de hindek berhemên dahîner hebin… çunku pitiriya nivîserên me ewên li derve dijîn xwedan şiyan û serboreka edebî ya bi hêz in.

Belê nebûna hizreka taybet ku evan edîb û nivîseran li dor xwe xirve bike bûye egera lawaziya nivîserên me ta radekî bûye giriftarî bo wan nexasme li qonaxên borî ku destgehên belavkirinê bi Kurdî li deverê gelek kêmbûn.

Her çende gelek hewil û bizav hate kirin ku nivîseran ji layê hindek destgehên edebî ku bişên van nivîseran hembêz bike, belê mixabin gelek ji van destgehan yên girêdayî hizb û layenên siyasî bûn, lewra nedişiyan hemû edîb û nivîseran li dor xwe kom bike û di encam de edîbê me yê dûrewelat tenê bû vegêrana serborên kesokî yên û nivîserên me, û neşiya bo xwe mifayekê baş ji serborên Ewropî webigire.